



К'ътеба Эстэр

Пешготън

К'ътеба Эстәре дъдә к'ъфше кё чawa т'эмамияа мыләте щьhu жь цыр'кърыне һатә хълазкърыне. Эва сәрнатийа бәри буйина Иса җör'на 5-да զә-шьмийә. We һынге императорийа Фаръс у Мәд-йанийа сәршерийа т'эмамияа Р'оһылата Незик дъкър, жь һындыстане гърти h'эта Африкайе. Гава Фаръса сәршерийа императорийа Бабилоне сала 539 (бәри буйина Иса) һылданә дәсте xwә, һынге wана изын да wан щьhуиед кё алийе Бабилонеда hecisp һатыбуnә бърyne, кё вәгәр'ынә wәлате xwә. Ле гәлә щьhуиа әв мәщал жь дәсте xwә кърын вә-нәгәр'ийан, әw щийед xwәда жь Фъльстине дәр бәлабуйи к'омәлед щьhутийеда ман. Ле чымки



K'itêba Ester

Pêşgotin

K'itêba Esterê dide k'ifşê ku çawa t'emamîya miletê cihû ji qir'kirinê hate xilazkirinê. Eva serhatîya berî bûyîna Îsa qur'na 5-da qewimîye. Wê hingê împératorîya Faris û Medyanîya serwêrîya t'emamîya R'ohilata Nêzîk dikir, ji Hindistanê girtî h'eta Afrîkayê. Gava Farisa serwêrîya împératorîya Babîlonê sala 539 (berî bûyîna Îsa) hildane destê xwe, hingê wana ïzin da wan cihûyêd ku alîyê Babîlonêda hêsîr hatibûne birinê, ku vege'r'i-ne welatê xwe. Lê gele cihûya ev mecal ji destê xwe kirin veneger'îyan, ew cîyêd xweda ji Filistînê der belabûyî k'omelêd cihûtîyêda man. Lê çimkî

Эстэр

щьhy алийе h'эбандын у э'дэтед хwэва гэлэки жь мълэтед дор-бэрэд хwэ фырqi дьбуn, эв йэк дьбу сэбэб əw ль бэр ч'э've мълэта r'эш дьбуn у waнr'a дьбуnэ дъжмьн. Эв дъжмьнайи ашкэла нава hамане wэзире p'адше Farьsa у Mордок'ай щьhуйе qольхк'арда k'ьфш дьбэ. ²Эстэра qизапа Mордок'ай, кё щийе ханьма p'адше Farьstanе дьгърэ, эв йэка дьдэ k'ьфше кё Xwэде chawa, щьmэ'ta хwэ жь tэнгасийя h'эta бэр дэре мърьне жи хълаз дькэ. Тыштэки э'щебмайи йэ, кё kани-я ве текста ibrанида qэт щарэке r'asti наве Xwэде найен у hэлэqэтийя wi ве cэрнатийeda ашкэла надэ k'ьфше. Ле йе кё ве k'ьтебе k'ур дьхунэ te дэрдхэ, кё эв cэрнатийя qэwьми hэма öса нэ бь сэре хwэ буйэ. R'asti Йe hэри Zор, Хöдан щьmэ'ta хwэ бь дэсте мэрьва, awa gotи Эстэре, Mордок'ай у p'адше Farьstanе хълаз дькэ, k'ижан кё kъryнэ ль сэр wan qольха, кё шewьра wi биньн сери. ³Хълазийе əw гэфа кё щьhуйia xwarыn, əw щьhуйar'a bu сэрk'этына сэр дъжмьнед хwэ. Эв сэрk'этын k'ьфш kъryн u нав kъryн, щэжьна «Пуrim», кё щьhy h'эta ньha жи ве щэжьне дькън. Ве щэжьнеда щьhy ве k'ьтебе дьхунын u фыкъред hаманнэ хъраб u э'r'нафийа Эстэре бир тиньн.

cihû alîyê h'ebandin û e'detêd xweva gelekî ji mile-têd dor-berêd xwe firqî dibûn, ev yek dibû sebeb ew li ber ç'e've mileta r'es dibûn û wanr'a dibûne dij-min. Ev dijminayî aşkela nava Hamanê wezîrê p'adşê Farisa û Mordok'ay cihûyê qulixk'arda k'ifş dibe.
² Esterâ qîzapa Mordok'ay, ku ciyê xanima p'adşê Faristanê digire, ev yeka dide k'ifşê ku Xwedê çawa, cime'ta xwe ji tengasiya h'eta ber derê mirinê jî xilaz dike. Tiştekî e'cêbmayî ye, ku kanîya vê têksta îbranîda qet carekê r'astî navê Xwedê nayên û hele-qetîya wî vê serhatîyêda aşkela nadî k'ifşê. Lê yê ku vê k'itêbê k'ûr dixûne tê derdixe, ku ev serhatîya qewimî hema usa ne bi serê xwe bûye. R'astî Yê Herrî Zor, Xudan cime'ta xwe bi destê meriva, awa gotî Esterê, Mordok'ay û p'adşê Faristanê xilaz dike, k'îjan ku kirine li ser wan qulixa, ku şewira wî bî-nin sérî. ³ Xilazîyê ew gefa ku cihûya xwarin, ew cihûyar'a bû serk'etina ser dijminêd xwe. Ev serk'e-tin k'ifş kirin û nav kirin,cejina «Pûrîm», ku cihû h'eta niha jî vê cejinê dikan. Vê cejinêda cihû vê k'i-têbê dixûnin û fikirêd Hamanne xirab û e'r'naffiya Esterê bîr tînin.

1

*Дэшлэмэндтийа п'адше у нэгöндарийа
к'ölфэта wu*

¹ Р'ожед Ah'ашверош п'адшада, к'ижани кё жь һындыстане гърти h'эта Өтиупийайе ль сэр сэд у бист h'эфт զэза п'адшати дыкър. ²We һынге, гава Ah'ашверош п'адша ль Суса զэсырда ль сэр т'эхте п'адшатийа xwә r'уныштыбу, ³әши сала п'адшатийа xwәйэ съсийа, мәсрәфәк bona h'эму wәзир-wәк'илед xwә дани, сәрәкәскәред Фарьстане у Мәд-йа, ѿса жи ә'сълзадә у сәршеред զэзайед бын дәстийя wiда т'эгльфкъри бун. ⁴Эши һынге гәләки дыреж, awa готи сәдһ'эйште р'ожи дэшлэмэндтийа п'адшатийа xwә у r'умәта мәзынайийа xwә да к'ыфше. ⁵Гава әw р'ож дәрбаз бун, ве щаре жи әши гази h'эму мәрьвед Суса զэсыр кър, жь мәзына гърти h'эта бъч'ука, bona wan h'эфт р'ожа мәсрәф h'әwша бахче hәрәма п'адшеда дани. ⁶П'эр'ded съпийэ жь пәмбу, զәдәке жь r'исе ширк, бъ бәне соре гәвәз у к'ытане вәгърти hәввакъри авити хәлацед зив у стунед мәрмәрва дардакъри бун. У т'эхт-бәрп'алед зер' у зив жи данибунә h'әwша кё бъ сәлед кәвърийэ к'эск, мәрмәре съпи, сәдәфи у мәрмәре r'энг-r'энгива нәдышанди бу. ⁷Дәрданед

1

Dewlemendtîya p'adşê û neguhdarîya k'ulfeta wî

¹ R'ojet Ah'aşwêroş p'adşada, k'îjanî ku ji Hindistanê girtî h'eta Etyûpîyayê li ser sed û bîst h'eft qeza p'adşatî dikir. ² Wê hingê, gava Ah'aşwêroş p'adşâ li Sûsa quesirda li ser t'extê p'adşatîya xwe r'ûniştibû, ³ ewî sala p'adşatîya xweye sisîya, mesrefek bona h'emû wezîr-wek'îlêd xwe danî, serekeskerêd Faristanê û Medya, usa jî e'silzade û serwêrêd qezayêd bin destîya wîda t'eglfkirî bûn. ⁴ Ewî hingê gelekî dirêj, awa gotî sedh'eyştê r'ojî dewlemendtîya p'adşatîya xwe û r'ûmeta mezinayîya xwe da k'ifşê. ⁵ Gava ew r'oj derbaz bûn, vê carê jî ewî gazî h'emû merivêd Sûsa quesir kir, ji mezina girtî h'eta biç'ûka, bona wan h'eft r'oya mesref h'ewşa baxçê herema p'adşêda danî. ⁶ P'er'dêd sipîye ji pembû, qedekê ji r'îsê şîrk, bi benê sorê gevez û k'itanê vegirtî hevvakirî avîtî xelaqêd zîv û stûnêd mermerva dardakirî bûn. Û t'ext-berp'alêd zêr' û zîv jî danîbûne h'ewşa ku bi selêd kevirîye k'esk, mermerê sipî, sedefî û mermerê r'eng-r'engîva neqîsandî bû. ⁷ Derdanêd

зер'да у щур'э-щур'э дәрданада тышт дъданә вәхварыне. Шәрава п'адше пър' бу, wәкә мәр'данийа wi. ⁸ hәр кәс аза бу вәхварынеда у т'о кәс h'әшше вәхварыне нәдьма, чымки п'адше ә'мьри h'әму бәрпърсийаред мала xwә кърьбу, кö әw дъле hәр кәсир'a hәр'ын. ⁹ Wash'tи ханьме жи bona к'ölфәта мәсрәф мала Ah'ашверош п'адшада дани.

¹⁰ Р'ожа h'әфта, гава дъле п'адше бъ шәраве к'ефхәш бъбу,gotә hәр h'әфт нәмеред бәрдәстийед xwә Мъхуман, Бизт'a, h'арбона, Бигт'a, Авагт'a, Зет'ар у К'арк'ас, ¹¹ кö әшана Wash'tи ханьме т'аще п'адшатийева биньнә ль бәр п'адше, wәки бәдәвәтийа we нишани мъләта, мир у бәга кә, чымки әw гәләки бәдәw бу. ¹² Ле Wash'tи ханьме нәхвәст кö т'әви нәмера бъчуйя у ә'мьре п'адше бъqәданда, п'адша қылqыли у жь herса алаве да сәре wi.

¹³ Ынгे п'адше gotә биланед зәмана* (чымки п'адше шешъра xwә wan h'әмуйя дъкър, йед кö қанун у р'ости заньбун, ¹⁴ оса жи h'әфт миред Фаръстан у Мәдийа ль щәм wi бун, К'аршына, Шет'ар, Адамат'a, Т'аршиш, Мәрәс, Марсына у Мъмук'ан, әвана р'үие п'адше дъдитын у ширәтк'аред п'адшайә пешын бун): ¹⁵ «Әм ль гора қануне чь

* 1:13 Эв билан бъ нишанед ә'rshed ә'змен у стәйрка h'але зәмен те дәрдыхъстьн.

zêr'da û cûr'e-cûr'e derdanada tişt didane vexwari-nê. Şerava p'adşê pir' bû, weke mer'danîya wî. ⁸ Her kes aza bû vexwarinêda û t'u kes h'ewcê vexwarinê nedima, çimkî p'adşê e'mirî h'emû berpirsiyaređ mala xwe kiribû, ku ew dilê her kesîr'a her'in. ⁹ Waştî xanimê jî bona k'ulfeta mesref mala Ah'aş-wêroş p'adşada danî.

¹⁰ R'oja h'efta, gava dilê p'adşê bi şeravê k'êfxwes bibû, gote her h'eft nemêrêd berdestîyêd xwe Mihû-man, Bîzt'a, H'arbona, Bîgt'a, Avagt'a, Zêt'ar û K'ark'as, ¹¹ ku ewana Waştî xanimê t'acê p'adşatîyêva bînine li ber p'adşê, wekî bedewetîya wê nîşanî milleta, mîr û bega ke, çimkî ew gelekî bedew bû. ¹² Lê Waştî xanimê nexwest ku t'evî nemêra biçûya û e'mirê p'adşê biqedanda, p'adşa qilqilî û ji hêrsa alavê da serê wî.

¹³ Hingê p'adşê gote bîlanêd zemana* (çimkî p'adşê şêwira xwe wan h'emûya dikir, yêd ku qanûn û r'astî zanibûn, ¹⁴ usa jî h'eft mîrêd Fâristan û Medîya li cem wî bûn, K'arşina, Şêt'ar, Adamat'a, T'arsîş, Meres, Marsina û Mimûk'an, evana r'ûyê p'adşê didîtin û şîretk'arêd p'adşê-ye pêşin bûn): ¹⁵ «Em li gora qanûnê çi

* ^{1:13} Ev bîlan bi nîşanêd e'rşêd e'zmên û steyrka h'alê ze-mên tê derdixistin.

гәрәке һында Waшт’и ханъмеда бъкын, кё әwe ә’мьре Ah’ашверош п’адша кё бъ нәмера ль we һатыбу ә’мъркърыне нәдәданد?»¹⁶ Һынге Мъмуқ’ан ль бәр п’адше у мираgot: «Waшт’и ханъме нә кё т’әне ль бәр п’адше шашити те бәр’да йә, ле ль бәр мир-бәга у т’әмамийа wан мъләтед әзайед Ah’ашверош п’адшада.¹⁷ Чымки къра ханъме we ль нава h’әму к’ölфәтда бәла бә, әwe жи гöр’а мере xwә нәкын у бежын: «Ah’ашверош п’адша ә’мър кър кё Waшт’и ханъме биньнә ль щәм wi, ле әw нә чу».¹⁸ Иро къре ханъме кё бъгънижә гöhe к’ölфәтед Фарьсийа у Мәдйанийа, әwe жи ёса щаба п’адше у мира бъдын у һынге we гәләк р’ү-р’әши у бет’ыфаи бъбә.¹⁹ Hәгәр әв йәк ль п’адше xwәш те, бъра жь wi զъараәк дәре, ль нава ҹану-нед Фарьс у Мәдйанийада бе ньвисаре, bona кё әw нәйе гöнастыне, кё Waшт’и иди т’ö щар нәйе ль бәр Ah’ашверош п’адша нәсекынә у п’адша ханъти-йа we бъдә к’ölфәтәкә жь we әнщтыр.²⁰ У гава әв ә’мьре п’адше ль нава h’әму п’адшатийа шида бе бынистыне, кё п’yr’ мәзынә, һынге h’әму к’ölфәте жи әдьре мере xwә бъгърын hәгәр әw фәdir бә йан дәвләмәнд бә».²¹ Әв готына ль п’адше у мира xwәш hat у п’адше ль гора готына Мъмуқ’ан кър.²² У һынге нә’мә т’әмамийа әзайед п’адшер’а һатынә шандыне, ль гора ньвисара hәр әзайе у

gerekê hindava Waştî xanimêda bikin, ku ewê e'mirê Ah'aşwêroş p'adşa ku bi nemêra li wê hatibû e'mirkirinê neqedand?»¹⁶ Hingê Mimûk'an li ber p'adşê û mîra got: «Waştî xanimê ne ku t'enê li ber p'adşê şaşîtî tê ber'da ye, lê li ber mîr-bega û t'emamîya wan miletêd qezayêd Ah'aşwêroş p'adşada.¹⁷ Çimkî kira xanimê wê li nava h'emû k'ulfetda bela be, ewê jî gur'a mîrê xwe nekin û bêjin: «Ah'aşwêroş p'adşa e'mir kir ku Waştî xanimê bînine li cem wî, lê ew ne çû». ¹⁸ İro kirê xanimê ku bigihîje guhê k'ulfetêd Farisîya û Medyanîya, ewê jî usa caba p'adşê û mîra bidin û hingê wê gelek r'ûr'eşî û bêt'i-faqî bibe. ¹⁹ Heger ev yek li p'adşê xweş tê, bira ji wî qirarek derê, li nava qanûnêd Faris û Medyanîyada bê nivîsarê, bona ku ew neyê guhastinê, ku Waştî idî t'u car neyê li ber Ah'aşwêroş p'adşa nese-kine û p'adşa xanimtiya wê bide k'ulfeteke ji wê qenctir. ²⁰ Ü gava ev e'mirê p'adşê li nava h'emû p'adşatîya wîda bê bihîstinê, ku p'ir' mezine, hingê h'emû k'ulfetê jî qedirê mîrê xwe bigirin heger ew feqîr be yan dewlemend be». ²¹ Ev gotina li p'adşê û mîra xweş hat û p'adşê li gora gotina Mimûk'an kir. ²² Ü hingê ne'me t'emamîya qezayêd p'adşer'a hatine şandinê, li gora nivîsara her qezayê û

ль гора зъмане hәр щымә’те, кә hәр кәс малхе мала xwә бә у бъ зъмане мъләте xwә хәбәрдә*.

2

Әстәр дъбә ханьма п'адше

¹ Пәй ван йәкар’а, гава herса Ah’ашшерош п’адша дани, әши Wash’tи ханым, кыре we у զъара xwә бир ани. ² Хöламед п’адшайә бәрдәсти готын: «Бъра bona п’адше զизед щаһылә бык’ыр у бәрбъч’ә’в бенә дәстхъстьне. ³ П’адша бъра ль нава զәзайед п’адшатийа xwәда сәршера к’ыфш кә, кә h’әму զизед щаһылә бык’ыр у бәрбъч’ә’в т’опи мала к’ölфәтайә ль Суса զәсьрда кын, бын сә’витийа hегайе нәмере п’адше у щабдаре к’ölфәт, wan-r’а тыштед bona шуштын-вәшүштыне бенә дайин. ⁴ Һынгे к’ижан զизед п’адша бәгәм кә, бъра әш бъбә ханьма п’адше, дәвса Wash’tи ханьме». Әв готына ль п’адше xwәш hat у Ѻса жи кыр.

⁵ Ль Суса զәсьрда мәръвәки щыңу дъма, наве wi Мордок’ай бу, кör’е Йаире, Шимиийе, Кисе жъ бәрәка Бынйаминийа. ⁶ Әва жъ Оршәлиме т’еви wan hesip hатыбу анине, к’ижан кö Нәбуқәднәсәр

* 1:22 ha жи те фә’мкърыне: «...Кö әв йәк нава hәр мъләтида бъ зъмане wan бе ә’ләмкърыне».

li gora zimanê her cime'tê, ku her kes malxê mala xwe be û bi zimanê miletê xwe xeberde*.

2

Ester dibe xanima p'adşê

¹ Pey van yekar'a, gava hêrsa Ah'aşwêroş p'adşa danî, ewî Waştî xanim, kirê wê û qirara xwe bîr anî. ² Xulamêd p'adşeye berdestî gotin: «Bira bona p'adşê qîzêd cahile bik'ir û berbiç'e'v bêne destxistinê. ³ P'adşa bira li nava qezayêd p'adşatîya xweda serwêra k'ifş ke, ku h'emû qîzêd cahile bik'ir û berbiç'e'v t'opî mala k'ulfetaye li Sûsa quesirda kin, bin se'vîtîya Hêgayê nemêrê p'adşê û cabdarê k'ulfet, wanr'a tiştêd bona şûştin-veşûştinê bêne dayîn. ⁴ Hingê k'îjan qîza ku p'adşa begem ke, bira ew bibe xanima p'adşê, dewsa Waştî xanimê». Ev gotina li p'adşê xweş hat û usa jî kir.

⁵ Li Sûsa quesirda merivekî cihû dima, navê wî Mordok'ay bû, kur'ê Yaîrê, Şîmîyê, Kîsê ji berreka Binyamînîya. ⁶ Eva ji Orşelîmê t'evî wan hêşîr hatibû anînê, k'îjan ku Nebûkedneser

* 1:22 Ha jî tê fe'mkirinê: «...Ku ev yek nava her miletîda bi zimanê wan bê e'lemkirinê».

п'адше Бабилоне, т'эви Йэхонийа п'адше Щынуда
несир анибун. ⁷ Эвилизата хвэ hadаса хвэй дъ-
кър, кё дыготьне Эстэр, чымки нэ баве we hэбу нэ
жи дийа we. Эwлизык бэдэw у бэжын-баледа ха-
сэ-хэшан бу, пэй мърына де у баве wep'a Мордо-
к'ай эw чашализ жь хвэр'a хвэй дыкър. ⁸ У гава
салъхе цырара п'адше hatэ бынистъне у ль Суса qэ-
сырда гэлэклиз щэвийанэ бын сэ'витийа negay.
hынгэ Эстэр жи мала п'адшеда hatэ qэбулкърыне,
бын сэ'витийа negay бэрпърсийаре жына. ⁹ negay
лизык бэгэм кър у эwe ль бэр wи k'эрэм дит у эви
пер'a-пер'a hэр тыштед п'ара weyэ шуштын-вэ-
шуштыне xварьнева, öса жи h'эфтлиз щарийэ
мала п'адшеда, k'ижан кё wep'a дык'этэн данэ we
у эw т'эви wan щарийа щигöнастэ мала k'ölфета-
йэ щийе hэри qэнщ. ¹⁰ Эстэре мълэт у r'ыk'ьнийата
хвэ э'ян нэкър, чымки Мордок'ай т'эми дабу
we, кё э'ян нэкэ. ¹¹ Мордок'ай hэр r'ож дора ма-
ла k'ölфета дычу-дыhat, wэки hatэ жь сыh'эт-qэ-
wat у h'ал-h'эвале Эстэре hэбэ.

¹² Гава wэ'де hэрлиз дыhat кё эw бык'эта щэм
Ah'ашверош п'адша, гэрэке эw э'дэте донздэh мэ-
hed k'ölфет hatэrbuner'a дэрбаз буйя, шэш mэha
бь r'уне зымье у шэш mэha жи бь r'уне бинхwэш
bыхата mэlh'эмкърыне у öса жи бь ду-дэрманед
майин, ¹³лизык hынгэ дык'этэ щэм п'адше, чь кё

p'adşê Babîlonê, t'evî Yexonîya p'adşê Cihûda hêsîr anîbûn. ⁷ Evî qîzapa xwe Hadasa xwey dikir, ku di-gotinê Ester, çimkî ne bavê wê hebû ne jî dîya wê. Ew qîzike bedew û bejin-balêda xase-xewan bû, pey mirina dê û bavê wêr'a Mordok'ay ew çawa qîz ji xwer'a xwey dikir. ⁸ Ü gava salixê qirara p'adşê hate bihîstinê û li Sûsa quesirda gelek qîz civîyane bin se'vîtîya Hêgay. Hingê Ester jî mala p'adşêda hate qebûlkirinê, bin se'vîtîya Hêgay berpirsiyarê jîna. ⁹ Hêgay qîzik begem kir û ewê li ber wî k'erem dît û ewî pêr'a-pêr'a her tiştêd p'ara wêye şûştin-ve-şûştinê xwarinêva, usa jî h'eft qîzêd carîye mala p'adşêda, k'îjan ku wêr'a dik'etin dane wê û ew t'evî wan carîya cîguhaste mala k'ulfetaye cîyê herî qenc. ¹⁰ Esterê milet û r'ik'inyata xwe e'yan nekir, çimkî Mordok'ay t'emî dabû wê, ku e'yan neke. ¹¹ Mordo-k'ay her r'oј dora mala k'ulfeta diçû-dihat, wekî has ji sih'et-qewat û h'al-h'ewalê Esterê hebe.

¹² Gava we'dê her qîzê dihat ku ew bik'eta cem Ah'aşwêroş p'adşa, gerekê ew e'detê donzdeh mehêd k'ulfet hazirbûnêr'a derbaz bûya, şes meha bi r'ûnê zimirê û şes meha jî bi r'ûnê bînxwes bihata melh'emkirinê û usa jî bi dû-dermanêd mayîn, ¹³ qîzik hingê dik'ete cem p'adşê, ci ku

Эстэр 2

дъле we дъхвэст, wep'a дънатэ дайине, bona кё т'еви xwэ жь мала к'ölфэт бъбъра мала п'адше.
¹⁴ Еваре əwa дъчу щэм п'адше събэhe зу вэдъгэр'ийа малэкэ к'ölфэтайэ майин, бын сэ'витийа бэрпърсийаре к'ölфэта, Шаһашыгазе нэмере п'адше. Əwa иди нэдъчу щэм п'адше, h'эта кё тэме п'адше нэк'ышандайе у бь наве we гази we нэкъра. ¹⁵ Гава wэхте Эстэра զиза Абихайиле апе Мордок'ай пер'a гъништ кё h'эр'э щэм п'адше, йа кё Мордок'ай чawa զиз xwэр'a xwэй кърьбу, əwa сэр готьна бэрпърсийаре к'ölфэта hегайе нэмере п'адшер'a дэрбаз нэбу, тыштэки башqэ нэхвэст. Эстэре ль бэр wan h'эмуйед кё əw дъдитын к'эрэм дит. ¹⁶ Эстэр мэha дэha, awa готи мэha Тебет'e* к'этэ щэм Ah'ашверош п'адша, h'эфтсалийа п'адшатийа шида ль мала п'адшеда hatэ qэбулкърыне. ¹⁷ П'адше Эстэре жь h'emu к'ölфэтед xwэ зэ'ftyр бэгэм кър у əwe ль бэр wi жь h'emu զиза зэ'ftyр h'ызкърын у к'эрэм дит у əwi т'аще п'адшатийе дани сэре we, дэwса Wash't'ийе кърэ ханым. ¹⁸ П'адше мэсрэфэкэ мэзын bona хатыре Эстэре wэzир-wэk'ил у хёламед xwэр'a дани, öса жи баре сэр qэza съвк кър у wékэ мэр'dанийа п'адше хэлат п'ешкеш дан.

* 2:16 Р'ожа ироин əw жь ниве мэha Дектембере дэстпедькэ h'эта ниве мэha Йанваре.

dilê wê dixwest, wêr'a dihate dayînê, bona ku t'evî xwe ji mala k'ulfet bibira mala p'adşê. ¹⁴ Êvarê ewa diçû cem p'adşê sibehê zû vediger'îya maleke k'ulfe-taye mayîn, bin se'vîtîya berpirsîyarê k'ulfeta, Şaha-şigazê nemêrê p'adşê. Ewa îdî nedîçû cem p'adşê, h'eta ku temê p'adşê nek'işandayê û bi navê wê gazi wê nekira. ¹⁵ Gava wextê Estera qîza Abîxayîlê apê Mordok'ay pêr'a gihîst ku her'e cem p'adşê, ya ku Mordok'ay çawa qîz xwer'a xwey kiribû, ewa ser gotina berpirsîyarê k'ulfeta Hêgayê nemêrê p'adşê'r'a derbaz nebû, tiştekî başqe nexwest. Este-rê li ber wan h'emûyêd ku ew didîtin k'erem dît. ¹⁶ Ester meha deha, awa gotî meha Têbêt'ê* k'ete cem Ah'aşwêroş p'adşa, h'eftsalîya p'adşatîya wîda li mala p'adşêda hate qebûlkirinê. ¹⁷ P'adşê Ester ji h'emû k'ulfetêd xwe ze'ftir begem kir û ewê li ber wî ji h'emû qîza ze'ftir h'izkirin û k'erem dît û ewî t'acê p'adşatîyê danî serê wê, dewsa Waşt'iyê kire xanim. ¹⁸ P'adşê mesrefeke mezin bona xatirê Esterê wezîr-wek'îl û xulamêd xwer'a danî, usa jî barê ser qeza sivik kir û weke mer'danîya p'adşê xelat p'êş-kêş dan.

* 2:16 R'oja îroîn ew ji nîvê meha Dêktêmberê destpêdike h'eta nîvê meha Yanvarê.

Мордок'ай сыр'a сәрһылдане дьh'асә

¹⁹ Гава щара дёда биз шъвандын, Мордок'ай ль бэр дәре п'адше р'уныштыбу*. ²⁰ Эстәре he мыләт у р'ык'ынийата хwә ә'ян нәкър бу, чаша кö Мордок'ай т'әми дабуйе. Чымки Эстәре he ёса гоhдари-иа Мордок'ай дыкър, чаша кö hена бын сә'витийиа шида. ²¹ Wan р'ожада гава Мордок'ай ль бэр дәре п'адше р'удынышт, дö дәргәhван, Бигт'ан у Т'эрәш, нәмеред п'адше гәф ль п'адше хварын у фыкърин кö дәсте хwә ль сәр Ah'ашшерош п'адша бъльнд кын. ²² Мордок'ай кö ве йәке h'әсийя, гиhандә гоhе Эстәр ханьме, Эстәре жи әв йәк бь наве Мордок'ай п'адшер'а гыли кыр. ²³ Әв дәңг hatә ленъhер'андыне р'аст дәрк'әт у hәр дö дәргәhван жи hатынә дархыс-тьне. У Бона ве қәнщия Мордок'ай к'ытеба бира-нина сәрнатийада ль бэр п'адше hatә ньвисаре.

3

Шешьра һаманә bona qyr'a щыhуя

¹ Пәй ван йәкар'a, Ah'ашшерош п'адша һамане көр'e һамьдат'айе Агаги мәзъын у бъльнд кыр у

* ^{2:19} Дәре п'адше әw щийе bona h'акъмтийе у щийе ше-шьера щымә'tе бу.

Mordok'ay sir'a serhildanê dih'ese

¹⁹ Gava cara duda qîz civandin, Mordok'ay li ber derê p'adşê r'ûniştibû*. ²⁰ Esterê hê milet û r'ik'in-yata xwe e'yan nekir bû, çawa ku Mordok'ay t'emî dabûyê. Çimkî Esterê hê usa guhdarîya Mordok'ay dikir, çawa ku hêna bin se'vîtiya wîda. ²¹ Wan r'o-jada gava Mordok'ay li ber derê p'adşê r'ûdinişt, du dergehvan, Bîgt'an û T'ereş, nemêrêd p'adşê gef li p'adşê xwarin û fikirîn ku destê xwe li ser Ah'aş-wêroş p'adşa bilind kin. ²² Mordok'ay ku vê yekê h'esîya, gîhande guhê Ester xanimê, Esterê jî ev yek bi navê Mordok'ay p'adşêr'a gilî kir. ²³ Ev deng hate lênihê'r'andinê r'ast derk'et û her du dergehvan jî hatine darxistinê. Ü Bona vê qencîya Mordok'ay k'itêba bîranîna serhatîyada li ber p'adşê hate nivîsarê.

3

Şêwira Hamane bona qir'a cihûya

¹ Pey van yekar'a, Ah'aşwêroş p'adşa Hamanê kur'ê Hamidat'ayê Agagî mezin û bilind kir û

* ^{2:19} Derê p'adşê ew cîyê bona h'akimtîyê û cîyê şêwira cime'tê bû.

к'ёрсийа wi жь к'ёрсийед мир-бэгед хwэ жортър кър. ² У h'эму холамед п'адшайэ ль бэр дэре п'адше, дэвэр'уйя дьчун у ль бэр hаман та дьбуn, чьмки п'адше bona wi эв эмър даву, ле Мордок'ай дэвэр'уйя нэдьчу у ль бэр wi та нэдьбу. ³ Hынгэ холамед п'адшайэ ль бэр дэре п'адше готьнэ Мордок'ай: «Чьма тё ль сэр эмъре п'адшер'a дэрбаз дьби?» ⁴ Wана hэр р'ож шир'a дьготын, ле бэрга тыштэки нэдьгърт, пэйр'a эв йэк гиһандынэ hаман, кё бъзаньбын к'a Мордок'ай ль сэр ия хwэ бъминэ йан на, чьмки эши wanr'a готьбу кё өw щьhy йэ. ⁵ Гава hаман дит, wэки Мордок'ай дэвэр'уйя начэ у ль бэр wi та набэ, өw нава хwэда гэлэки үлцэли. ⁶ Ле шир'a шэрм бу кё т'энэ дэсте хwэ ль сэр Мордок'ай бъльнд кэ, чьмки иди шир'a готьбуn Мордок'ай жь к'ижан мълэти йэ. hаман фыкьри кё h'эму щьнуийед мълэте Мордок'ай ль т'эмамийа п'адшатийа Ah'ашшерошда үр' кэ.

⁷ У донздэхсалийа Ah'ашшерош п'адша, мэha йэке, awa хоти мэha Нисанеда* ль бэр hаман bona мэрэме wi, bona р'ож у мэh к'ыфшкърыне п'ур, awa хоти п'эшк дьнатэ авитъне у өw к'этэ мэha

* ^{3:7} Р'ожа ироин өw жь ниве мэha Марте дэстпэдьке h'эта ниве мэha Апреле.

k'ursîya wî ji k'ursîyêd mîr-begêd xwe jortir kir.
² Û h'emû xulamêd p'adşêye li ber derê p'adşê, de-
ver'ûya diçûn û li ber Haman ta dibûn, çimkî p'adşê
bona wî ev e'mir dabû, lê Mordok'ay dever'ûya
nediçû û li ber wî ta nedibû. ³ Hingê xulamêd p'ad-
şêye li ber derê p'adşê gotine Mordok'ay: «Çima tu
li ser e'mirê p'adşêr'a derbaz dibî?» ⁴ Wana her r'oј
wîr'a digotin, lê berga tiştekî nedigirt, peyr'a ev
yen gîhandine Haman, ku bizanibin k'a Mordok'ay
li ser ya xwe bimîne yan na, çimkî ewî wanr'a go-
tibû ku ew cihû ye. ⁵ Gava Haman dît, wekî Mordo-
k'ay dever'ûya naçe û li ber wî ta nabe, ew nava
xweda gelekî qilqilî. ⁶ Lê wîr'a şerm bû ku t'enê des-
tê xwe li ser Mordok'ay bilind ke, çimkî idî wîr'a
gotibûn Mordok'ay ji k'îjan miletî ye. Haman fikirî
ku h'emû cihûyêd miletê Mordok'ay li t'emamîya
p'adşatîya Ah'aşwêroşda qir' ke.

⁷ Ü donzdehsalîya Ah'aşwêroş p'adşa, meha ye-
kê, awa gotî meha Nîsanêda* li ber Haman bona
meremê wî, bona r'oј û meh k'ifşkirinê p'ûr,
awa gotî p'esk dihate avîtinê û ew k'ete meha

* 3:7 R'oja îroîn ew ji nîvê meha Martê destpêdikê h'eta nîvê
meha Aprêlê.

донзәһа, кө дьбә мәһа Адаре*. ⁸ Йынгे һаман готә Ah'ашверош п'адша: «Мъләтәк нава h'әму мъләтед қәзайед п'адшатийа тәда hәйә, нава wан мъләтада башqәбуи бәла буйә. Қанунед wан жъ қанунед h'әму мъләта башqә нә. Әвана қанунед п'адше наqәдиның у дәст надә кө п'адша ван aha бүнелә. ⁹ hәгәр әв йәк ль п'адше xwәш те, быра ә'мър дәрк'әвә, кө զыр'a ван бе анине. Әз xwәха жи, әзе дәhә h'әзар тәланте зив** бык'ышинъм бъдымә дәсте qöльхк'ара кө бъкынә хъзна п'адше». ¹⁰ Йынге п'адше жъ т'ълийа xwә, гостила xwә дәрхъст, да һамане көр'e һамъдат'айе Агагийе нәйаре щыhуя, кө ә'мъре мъқабыли щыhуя мор кә. ¹¹ Йынге п'адше готә һаман: «Әз әши зиви жи, wи мъләти жи дъдымә тә, тө чаша дыхвази ёса жи бъкә». ¹² Сездәhе мәһа йәке ньвиск'аред п'адше һатынә газикърыне у wәк'илед п'адшер'a, h'әму wәлийед ль сәр қәзар'a, hәр ахайе ль сәр hәр мъләтир'a, hәр қәзайер'a бъ ньвисара wан у hәр мъләтир'a бъ зымане wан, анәгори фәрмана һаман бъ наве Ah'ашверош п'адша һатә ньвисаре у бъ гостила п'адше һатә моркърыне. ¹³ Әw ньвисар

* 3:7 Р'ожа ироин әw жъ ниве мәһа Феврале дәстпедьке h'әта ниве мәһа Марте.

** 3:9 «Дәhә h'әзар тәланте зив» дыкә wәкә 350 тон зив.

donzdeha, ku dibe meha Adarê*. ⁸ Hingê Haman go-te Ah'aşwêroş p'adşa: «Miletik nava h'emû miletêd qezayêd p'adşatîya teda heye, nava wan miletada başqebûyî bela bûye. Qanûnêd wan ji qanûnêd h'e-mû mileta başqe ne. Evana qanûnêd p'adşê naqedî-nin û dest nade ku p'adşa van aha bihêle. ⁹ Heger ev yek li p'adşê xweş tê, bira e'mir derk'eve, ku qir'a van bê anînê. Ez xwexa jî, ezê dehe h'ezar telantê zîv** bik'işnim bidime destê qulixk'ara ku bikine xizna p'adşê». ¹⁰ Hingê p'adşê ji t'ilîya xwe, gustîla xwe derxist, da Hamanê kur'ê Hamidat'ayê Agagîyê neyarê cihûya, ku e'mirê miqabilî cihûya mor ke. ¹¹ Hingê p'adşê gote Haman: «Ez ewî zîvî jî, wî mile-tî jî didime te, tu çawa dixwazî usa jî bike». ¹² Sêz-dehê meha yekê nivîsk'arêd p'adşê hatine gazîkirinê û wek'îlêd p'adşêr'a, h'emû welîyêd li ser qezar'a, her axayê li ser her miletîr'a, her qezayêr'a bi nivî-sara wan û her miletîr'a bi zimanê wan, anegorî fer-mana Haman bi navê Ah'aşwêroş p'adşa hate nivî-sarê û bi gustîla p'adşê hate morkirinê. ¹³ Ew nivîsar

* 3:7 R'oja îroîn ew ji nîvê meha Fêvralê destpêdikê h'eta nî-vê meha Martê.

** 3:9 «Dehe h'ezar telantê zîv» dike weke 350 ton zîv.

бы дәсте қәвала h'әму қәзайед п'адшер'a һатынә шандыне, кө нава р'ожәкеда, мәһа донздәһа, awa готи сездәһе мәһа Адаре, h'әму щыңуя, бъч'ук у мәзьн, жына у зар'a қыр' қын, бъкёжын у к'оке ле биньн у hәбука wan т'алан қын бъбын.¹⁴ Эв қыра-ра ньвисар ль нава h'әму қәзада чаша фәрман һатә ә'ламкърыне, шәки bona we р'оже h'әму мъ-ләт назър сәкъни бын.¹⁵ Qәвал пе қыра-ра п'адше зу р'ек'етън чун у фәрмана ньвисар ль Суса қә-сърда жи данә ә'ламкърыне. П'адша у һаман р'у-ныштын вәхшын, ле бажаре Сусайе сәр hәвр'a дәр-баз дъбу.

4

Мордок'ай алиқ'арийе жъ Әстәре дыхвазә

¹ Мордок'ай гава ве йәке гышки пе h'әсийа, к'ын-ще xwә қәлаштын, к'өрх ль xwә кыр, xwәли ль сәр xwә кыр. Паше чу нава бажер бы дәнгә шина гъ-ран дъкърә қар'ин,² гъништә h'әта ль бәр дәргәһе п'адше сәкъни, чымки мәръве к'өрххәкъри ныка-рьбу дәргәһе п'адшер'a дәрбаз буйа.³ h'әму қәза-да, к'идәре кө әw фәрмана п'адшейә ньвисар дъ-гъниште, нава щыңуяда шинәкә гъран бы р'ожи, гъри у зарә-заре дәстпельбу. Һынәка жи ль сәр к'өрх у к'өзийе п'ал дъдан.

bi destê qewala h'êmû qezayêd p'adşêr'a hatine şandinê, ku nava r'ojekêda, meha donzdeha, awa gotî sêzdehê meha Adarê, h'êmû cihûya, biç'ûk û mezin, jina û zar'a qir' kin, bikujin û k'okê lê bînin û hebûka wan t'alan kin bibin.¹⁴ Ev qirara nivîsar li nava h'êmû qezada çawa ferman hate e'lamkiri-nê, wekî bona wê r'ojê h'êmû millet hazir sekînî bin.¹⁵ Qewal pê qirara p'adşê zû r'êk'etin çûn û fermaña nivîsar li Sûsa qesirda jî dane e'lamkirinê. P'adşa û Haman r'ûniştin vexwin, lê bajarê Sûsayê ser hevr'a derbaz dibû.

4

Mordok'ay alîk'arîyê ji Esterê dixwaze

¹ Mordok'ay gava vê yekê gişkî pê h'esîya, k'ince xwe qelaştin, k'urx li xwe kir, xwelî li ser xwe kir. Paşê çû nava bajêr bi dengê şîna giran dikire qar'în,² gîhîşte h'eta li ber dergehê p'adşê sekînî, çimkî merivê k'urxxwekirî nikaribû dergehê p'adşêr'a derbaz bûya.³ H'êmû qezada, k'îderê ku ew fermaña p'adşêye nivîsar digihîştê, nava cihûyada şîneke giran bi r'ojî, girî û zare-zarê destpêdibû. Hineka jî li ser k'urx û k'uzîyê p'al didan.

⁴ Щарийед Эстэре у нэмеред we хатын у bona Мордок'ай wer'a готын, ханым гэлэки т'эвиһэв бу у к'ынщ шандын, кё Мордок'ай кын у к'öрх жь сэр wi бехын, ле wi qäбул нэкър. ⁵ hынгэ Эстэре жь нэмеред п'адше гази hat'ak' кыр, к'ижан кё п'адше к'ыфш кырьбу кё бэрдэстийа we быкэ у шандэ щэм Мордок'ай кё бъзаньбэ, к'а эw чь h'эwал э у чьма öса дъкэ? ⁶ hat'ak' чу щэм Мордок'ай ль мэйдана бэр дэре п'адше. ⁷ Мордок'ай hэр тышт wир'a гор, чь кё ль wi qäwьми бу, öса жи эw готына hаман готе, кё эши bona щьнуя зив жи соз дайэ быкэ хъзна п'адше, кё к'ока wan биньн. ⁸ Бона qыр'кырьна wan жи, Мордок'ай к'ахаза Сусайеда ль бэр фэрмана ньвисар гырти да wi, кё нишани Эстэре кэ, wer'a жи шьровэкэ у бежеда кё бык'эвэ щэм п'адше, лава жь wi быкэ у bona мълэте xwэ дэлилэке же быхвазэ.

⁹ hat'ak' чу готынед Мордок'ай Эстэрер'а готын.
¹⁰ Эстэр hat'ak' ль сэр Мордок'айда вэгэр'анд у готеда кё aha бежейи: ¹¹ «h'эму бэрдэстийед п'адше у мълэted qэzайед п'адше qэнц занын, кё hэр мер, йан жына кё бе газикырьн бык'эвэ h'эwша п'адшайэ hындöр', bona wan данунэкэ кёштыне hэйэ, т'эне эwe сах бъминэ, к'ижан кё п'адша шьва xwэйэ зер'ин бэрбэр'и кэ. Ле эва иди си р'оже мънэ кё п'адше гази мън нэкърийэ». ¹² Готынед

⁴ Carîyêd Esterê û nemêrêd wê hatin û bona Mordok'ay wêr'a gotin, xanim gelekî t'evîhev bû û k'inc şandin, ku Mordok'ay kin û k'urx ji ser wî bê-xin, lê wî qebûl nekir. ⁵ Hingê Esterê ji nemêrêd p'adşê gazî Hat'ak' kir, k'îjan ku p'adşê k'ifş kiribû ku berdestîya wê bike û şande cem Mordok'ay ku bizanibe, k'a ew çi h'ewal e û çîma usa dike? ⁶ Hat'ak' çû cem Mordok'ay li meydana ber derê p'adşê. ⁷ Mordok'ay her tişt wîr'a got, çi ku li wî qewimî bû, usa jî ew gotina Haman gotê, ku ewî bona ci-hûya zîv jî soz daye bike xizna p'adşê, ku k'oka wan bînin. ⁸ Bona qir'kirina wan jî, Mordok'ay k'a-xaza Sûsayêda li ber ferманa nivîsar girtî da wî, ku nîşanî Esterê ke, wêr'a jî şiroveke û bêjêda ku bik'eve cem p'adşê, lava ji wî bike û bona miletê xwe delîlekê jê bixwaze.

⁹ Hat'ak' çû gotinêd Mordok'ay Esterêr'a gotin. ¹⁰ Ester Hat'ak' li ser Mordok'ayda vege'r'and û gotêda ku aha bêjêyî: ¹¹ «H'emû berdestiyêd p'adşê û miletêd qezayêd p'adşê qenc zanin, ku her mîr, yan jina ku bê gazîkirin bik'eve h'ewşa p'adşêye hindur', bona wan qanûneke kuştinê heye, t'enê ewê sax bimîne, k'îjan ku p'adşa şiva xweye zér'in berbir'î ke. Lê eva îdî sî r'oje mine ku p'adşê gazî min nekirîye». ¹² Gotinêd

Эстәре гиһандынә Мордок'ай. ¹³ Мордок'ай щаб лъ сәр Эстәреда шанд у готе: «Нәфькърә кö тö мала п'адшеда йи, жъ h'emu щьhуя тe т'эне хълаз би. ¹⁴ Awa hәgәr тö ви wәхтида xwә kәr' ki, we жъ щики дън k'omәk у азади бъгънижә щьhуя, ле тö у мала баве xwәva hуне öнда бън, k'и занә кö тö bona r'ожа иройин нәбуий ханъма п'адше». ¹⁵ һынгे Эстәре щаб сәр Мордок'айда шанд у готе: ¹⁶ «hәp'ә h'emu щьhуjed кö Сусайеда дъмнин т'оп кә у bona мън r'ожи бъгърын, се r'ожа нә шәв нә r'ож, нә бъхън нә вәхън. Эзе жи öса т'эви щарийед xwә r'ожи бъгърым у сәр данунер'a дәрбаз бым, бък'евымә щәм п'адше, hәgәr бъмърым жи бъра бъмърым». ¹⁷ һынге Мордок'ай чу öса кър, chawa кö Эстәре wirp'a гот.

5

Эстэр p'адше у һаман т'әглифи мәсрәфе дъка

¹ Р'ожа съсийа Эстәре к'ынще xwәйә ханъмтийе xwә кър, h'ewsha һындör'e hәrәmedа, пешбәри мала п'адше сәкъни. П'адша хана п'адшатийеда, пешбәри дәри лъ сәр т'эхте п'адшатийа xwә r'үнштъбу. ² Гава п'адше Эстэр ханъм дит, кö h'ewшеда сәкъни йә, Эст'эре лъ бәр wi к'эрәм дит у п'адше шьва дәсте xwәдайә зер'ин дърежи we кър.

Esterê gîhandine Mordok'ay. ¹³ Mordok'ay cab li ser Esterêda şand û gotê: «Nefikire ku tu mala p'adşêda yî, ji h'emû cihûya tê t'enê xilaz bî. ¹⁴ Awa heger tu vî wextîda xwe ker' kî, wê ji cîkî din k'omek û azadî bigihîje cihûya, lê tu û mala bavê xweva hûnê unda bin, k'î zane ku tu bona r'oja îroyîn nebûyî xanima p'adşê». ¹⁵ Hingê Esterê cab ser Mordok'ayda şand û gotê: ¹⁶ «Her'e h'emû cihûyêd ku Sûsayêda dimînin t'op ke û bona min r'ojojî bigirin, sê r'oja ne şev ne r'oj, ne bixwin ne vexwin. Ezê jî usa t'evî carîyêd xwe r'ojojî bigirim û ser qanûnêr'a derbaz bim, bik'evime cem p'adşê, heger bimirim jî bira bimirim». ¹⁷ Hingê Mordok'ay çû usa kir, çawa ku Esterê wîr'a got.

5

Ester p'adşê û Haman t'eglîfî mesrefê dike

¹ R'oja sisîya Esterê k'incê xweye xanimtîyê xwe kir, h'ewşa hindur'ê heremêda, pêşberî mala p'adşê sekinî. P'adşa xana p'adşatîyêda, pêşberî derî li ser t'extê p'adşatîya xwe r'ûniştibû. ² Gava p'adşê Ester xanim dît, ku h'ewşêda sekinî ye, Est'erê li ber wî k'erem dît û p'adşê şiva destê xwedaye zêr'in dirêjî wê kir.

Әст’эр незик чу ль сәре шъве к’эт. ³ П’адше готә we: «Әстәр һаным, әв чь h’әwал ә? Xwәстьна тә чь йә? h’әта ниве п’адшатийа xwә жи әзе бъдымә тә». ⁴ Әстәре гот: «hәгәр we ль п’адше xwәш бе, бъра п’адша иро т’эви һаман бе мәсрәфа кö әз bona п’адше дыкъм». ⁵ П’адше гот: «Зу гази һаман кън, wәки xwәстьна Әстәре бинә сери». П’адша т’эви һаман чу мәсрәфа Әстәрейә дани. ⁶ Гава шәрав вәдъхарын, п’адше готә Әстәре: «Дә бежә, xwәстьна тә чь йә? We тәр’а бе дайине, чь hиви дыки? h’әта ниве п’адшатийа мын бә жи, we бе сери». ⁷ Әстәре ле вәгәр’анд у готе: «Әв ә xwәстьн у hивикърына мын: ⁸ hәгәр мын ль бәр п’адше к’әрәм дитийә у hәгәр xwәстьна мын жи ль п’адше xwәш те, кö hивикърына мын бинә сери, бъра п’адша у һаман бенә мәсрәфа кö әзе bona шан дайным у събе әзе бы готьна п’адше бъкъм».

Һаман дықә кö Мордок’ай бъда койштыне

⁹ We р’оже һаман бь дыле әшq у ша дәрк’эт чу, ле гава һаман Мордок’ай ль бәр дәре п’адше r’уньши дит, кö ль бәр wi r’анабә у жь щийе xwә жи nah’әжә, алаве да qafe һаман. ¹⁰ Ле һаман we дәме xwә зәфт кър у гава вәгәр’ийә мал, шанд гази жына xwә Зәрәше у пъсмамед xwә кърын. ¹¹ һаман шанr’а гот bona hәбука xwәйә п’yr’, bona

Est'er nêzîk çû li serê şivê k'et. ³ P'adşê gote wê: «Ester xanim, ev ci h'ewal e? Xwestina te ci ye? H'eta nîvê p'adşatîya xwe jî ezê bidime te». ⁴ Esterê got: «Heger wê li p'adşê xweş bê, bira p'adşa îro t'evî Haman bê mesrefa ku ez bona p'adşê dikim». ⁵ P'adşê got: «Zû gazî Haman kin, wekî xwestina Esterê bîne sêrî». P'adşa t'evî Haman çû mesrefa Esterêye danî. ⁶ Gava şerav vedixwarin, p'adşê gote Esterê: «De bêje, xwestina te ci ye? Wê ter'a bê da-yînê, ci hîvî dikî? H'eta nîvê p'adşatîya min be jî, wê bê sêrî». ⁷ Esterê lê vege'r'and û gotê: «Ev e xwestin û hîvîkirina min: ⁸ Heger min li ber p'adşê k'erem dîtîye û heger xwestina min jî li p'adşê xweş tê, ku hîvîkirina min bîne sêrî, bira p'adşa û Haman bêne mesrefa ku ezê bona wan daynim û sibê ezê bi gotina p'adşê bikim».

Haman dike ku Mordok'ay bide kuştinê

⁹ Wê r'ojet Haman bi dilê eşq û şa derk'et çû, lê gava Haman Mordok'ay li ber derê p'adşê r'û-niştî dît, ku li ber wî r'anabe û ji cîyê xwe jî na-h'eye, alavê da qafê Haman. ¹⁰ Lê Haman wê demê xwe zeft kir û gava vege'r'îya mal, şand gazî jina xwe Zeresê û pîsmamêd xwe kirin. ¹¹ Haman wanr'a got bona hebûka xweye p'ir', bona

xwэйе гэлэк кёр’а, bona wан тышта, бь к’ижана п’адше өw мэзьн кърийэ у чawa өw жь мир-бэга у жь хёламед п’адше бъльндтър кърийэ. ¹² Ле бэле hаман гот: «h’эта Эстэр ханьме жи пештыри мън кэсэк т’эви п’адше т’эглифи мэсрэфа xwэйэ дани нэкър, bona събе жи эз т’эви п’адше т’эглифкъри-йе щэм we мэ. ¹³ Ле р’аст өв h’эму жи bona мън нэ т’о тышт ьн, h’эта кё эз Мордок’айе щыну ль бэр дэре п’адше р’уньши бъбиньм». ¹⁴ hынге Зэрэша жына wi у h’эму пьсмамед wi ле вэгэр’андын у готынэ wi: «Быра бъльндайийа пенщи зэнди да-рэк бе назыркърыне у сэре събе бежэ п’адше, быра Мордок’ай ль сэр бе лехьстыне у паше тö т’эви п’адше бь дыле r’ыh’эт hэр’э мэсрэфе». Эв готына ль hаман xwэш hat у өw дар да назыркърыне.

6

П’адша qэнцийа Мордок’ай дышекърина

¹ We шэве хэwa п’адше т’эдьси, эши э’мър кър, кё к’теба биранина сэргатийа биньн ль бэр п’ад-ше быхуньн. ² Wеда ньвисар hatэ дитъне, кё Мор-док’ай э’ламэти дабу, кё чawa дö нэмеред п’ад-шэйэ дэргэhван, Бигт’ан у Т’эрэш шешьра xwэ кърьбуn кё дэсте xwэ ль сэр Ah’ашшерош п’ад-ша бъльнд кын. ³ hынге п’адше гот: «Ле жь бэр we

xweyê gelek kur'a, bona wan tişta, bi k'îjana p'adşê ew mezin kirîye û çawa ew ji mîr-bega û ji xulamêd p'adşê bilindtir kirîye. ¹² Lê belê Haman got: «H'eta Ester xanimê jî pêştirî min kesek t'evî p'adşê t'eglîfî mesrefa xweye danî nekir, bona sibê jî ez t'evî p'adşê t'eglîfkirîyê cem wê me. ¹³ Lê r'ast ev h'emû jî bona min ne t'u tişt in, h'eta ku ez Mordok'ayê cihû li ber derê p'adşê r'ûniştî bibînim». ¹⁴ Hingê Zereşa jina wî û h'emû pismamêd wî lê vege'r'andin û gotine wî: «Bira bilindayîya pêncî zendî darek bê hazirkirinê û serê sibê bêje p'adşê, bira Mordok'ay li ser bê lêxistinê û paşê tu t'evî p'adşê bi dilê r'iħ'et her'e mesrefê». Ev gotina li Haman xweş hat û ew dar da hazirkirinê.

6

P'adşa qencîya Mordok'ay dişêkirîne

¹ Wê şevê xewa p'adşê t'eqisî, ewî e'mir kir, ku k'itêba bîranîna serhatîya bînin li ber p'adşê bixûnin. ² Wêda nivîsar hate dîtinê, ku Mordok'ay e'lamatî dabû, ku çawa du nemêrêd p'adşê-ye dergehvan, Bîgt'an û T'ereş şêwira xwe kiri-bûn ku destê xwe li ser Ah'aşwêroş p'adşa bilind kin. ³ Hingê p'adşê got: «Lê ji ber wê

qэншийева чь qэдър йан hörmët Мордок'айр'a
натийэ кырыне?» Бэрдэстийед p'адше готьне: «T'ö
тышт bona wi нэhатийэ кырыне». ⁴ П'адше гот:
«h'ëwшeda к'и hэйэ?» We дэме жи hаман hатыбу
h'ëwша мала p'адшайэ дэрва кё t'эви p'адше хэ-
бэр дэ, wэки Мордок'ай ль wi дари хын, к'ижан
кё bona wi hатыбу назыркырыне. ⁵ Бэрдэстийед
p'адше готынэ wi: «Ba йэ hаман h'ëwшeda йэ».
П'адше гот: «Быра бе hындöр». ⁶ Гава hаман hатэ
hындöр', p'адше wир'a гот: «hаман, bona wi мэ-
рьве кё p'адша быхвазэ qэдърэки wир'a быкэ, бь
t'эхмина тэ чь бе кырыне?» hаман дыле xwэда фь-
кьри xwэха xwэр'a гот: «Пештири мын иди p'ад-
шайе к'ер'a быхвазэ qэдър быкэ?» ⁷ hынгэ hаман
ль p'адше вэгэр'анд у готе: «Бона wi мэryве кё
p'адша дыхвазэ жер'a qэдър быкэ, ⁸ быра wир'a
k'ынща p'адшатийэйэ кё p'адша ль xwэ wэрдьгь-
рэ биньн, wi hëспе k'офиya p'адшатийе сери би-
нин k'ижан кё p'адша ле сийар дьбэ ⁹ у k'ынщ у
hëспе бьдьнэ дэсте гырэ-гыре миред p'адше йэки
у k'ынща ль wi мэryви кын, йе кё p'адша дыхвазэ
wир'a qэдър быкэ, эши ль hëспе сийар кын, бьбь-
нэ мэйдана бажер у пешийа wi бькынэ гази: «Бо-
на wi мэryви we aha бе кырыне, k'ижаниr'a кё
p'адша быхвазэ qэдър быкэ!» ¹⁰ hынгэ p'адше готэ
hаман: «Дэ ньha ль гора we готына xwэ зу r'абэ,

qencîyêva ci qedir yan hurmet Mordok'ayr'a hatîye kîrinê?» Berdestîyêd p'adşê gotinê: «T'u tişt bona wî nehatîye kîrinê». ⁴ P'adşê got: «H'ewşêda k'î heye?» Wê demê jî Haman hatibû h'ewşa ma-la p'adşêye derva ku t'evî p'adşê xeber de, wekî Mordok'ay li wî darî xin, k'îjan ku bona wî hatibû hazirkîrinê. ⁵ Berdestîyêd p'adşê gotine wî: «Va ye Haman h'ewşêda ye». P'adşê got: «Bira bê hindur». ⁶ Gava Haman hate hindur', p'adşê wîr'a got: «Haman, bona wî merivê ku p'adşa bi-xwaze qedirekî wîr'a bike, bi t'exmîna te ci bê kîrinê?» Haman dilê xweda fikirî xwexa xwer'a got: «Pêştirî min idî p'adşayê k'êr'a bixwaze qedir bike?» ⁷ Hingê Haman li p'adşê veger'and û gotê: «Bona wî merivê ku p'adşa dixwaze jêr'a qedir bike, ⁸ bira wîr'a k'inca p'adşatîyêye ku p'adşa li xwe werdigire bînin, wî hespê k'offiya p'adşatîyê sêrî bînin k'îjan ku p'adşa lê sîyar dibe ⁹ û k'inc û hespê bidine destê gire-girê mîrêd p'adşê yekî û k'inca li wî merivî kin, yê ku p'adşa dixwaze wîr'a qedir bike, ewî li hespê sîyar kin, bibine meydana bajêr û pêşîya wî bikine gazî: «Bona wî merivî wê aha bê kîrinê, k'îjanîr'a ku p'adşa bixwaze qedir bike!» ¹⁰ Hingê p'adşê gote Haman: «De niha li gora wê gotina xwe zû r'abe,

к'ынщ у hәспе hылдә, bona Мордок'айе щыhu кö ль бәр дәре п'адше р'удыне öса бъкә, жь we готьна тә, бъра т'ö тышт же кем нәбә». ¹¹ hаман к'ынщ у hәсп hылдан, к'ынщ ль Мордок'ай кыр, әw ль hәспе сийар кыр, бърә мәйдана бажер, пешийа wi дыкърә гази: «Бона wi мәрьви we aha бе кърыне, к'ижанир'a кö п'адша быхвазә qәдър бъкә!» ¹² Мордок'ай вәгәр'ийя ль бәр дәре п'адше, ле hаман мә'dәкъри жь шәрма сәргъредайи ләзанд чу мала xwә. ¹³ hаман әв hәр тыште кö hatә сәре wi, жына xwә Зәрәше у h'әму пысмамед xwәр'a гыли кыр. hынге биланед wi у жына wi Зәрәше шир'a готын: «hәгәр Мордок'ай жь мыләте щыhu йә, р'уйе к'ижанида тә дәстпекър бък'еви те зора wi нәби, ль бәр wi те ә'сә дәвәр'үйя hәр'i». ¹⁴ Вана he т'еви wi хәбәр дъдан, нәмеред п'адше hатын, hаман ләзхъстын, кö hәр'ә we мәсрәфа кö Эстәре назыр кърийә.

7

hаман te дархъстыне

¹ П'адша т'еви hаман чу мәсрәфе щәм Эстәре.
² Р'ожа дöда жи кö дыхварын у шәрав вәдыхварын п'адше хотә Эстәре: «Эстэр ханым, дә бежә xwәстына тә чь йә? We тәр'a бе дайине. Чь hиви дыки? h'эта ниве п'адшатыйа мын бә жи, we бе сери».

k'inc û hespê hilde, bona Mordok'ayê cihû ku li ber derê p'adşê r'ûdinê usa bike, ji wê gotina te, bira t'u tişt jê kêm nebe». ¹¹ Haman k'inc û hesp hildan, k'inc li Mordok'ay kir, ew li hespê sîyar kir, bire meydana bajêr, pêşîya wî dikire gazî: «Bona wî merivî wê aha bê kirinê, k'îjanîr'a ku p'adşa bixwaze qedir bike!» ¹² Mordok'ay vege'rîya li ber derê p'adşê, lê Haman me'dekirî ji şerma sergirêdayî lezand çû mala xwe. ¹³ Haman ev her tiştê ku hate serê wî, jina xwe Zeresê û h'emû pis-mamêd xwer'a gilî kir. Hingê bîlanêd wî û jina wî Zeresê wîr'a gotin: «Heger Mordok'ay ji miletê ci-hû ye, r'ûyê k'îjanîda te destpêkir bik'evî tê zora wî nebî, li ber wî tê e'se dever'ûya her'î». ¹⁴ Vana hê t'evî wî xeber didan, nemêrêd p'adşê hatin, Haman lezxistin, ku her'e wê mesrefa ku Esterê hazir kirîye.

7

Haman tê darxistinê

¹ P'adşa t'evî Haman çû mesrefê cem Esterê.

² R'oja duda jî ku dixwarin û şerav vedixwarin p'adşê gote Esterê: «Ester xanim, de bêje xwestina te çi ye? Wê ter'a bê dayînê. Çi hîvî dikî? H'eta nîvê p'adşatîya min be jî, wê bê sêrî».

³ Эстэр ханъме ле вэгэр'анд: «Һәгәр мын ль бәр ч'ә'ве тә к'әрәм дитийә, п'адшайи хвәш бә у һәгәр хвәстьна мын ль п'адше хвәш те, быра э'мьре мын ль мын бе п'ешк'ешкърыне у жь бәр һивикърьна мынва жи, мъләте мын! ⁴ Чымки әз мъләте хвәва զър'кърын, кöштын у ѿндакърынер'a һатьнә фьротане. Һәгәр әм чаша хöлам у хöламок һатьбуна фьротане, мыне җәт дәңг нәкъра, ле бәле нәйар ныкарә зийана п'адше ле вэгэр'инә*». ⁵ Ынге Ah'ашшерош п'адша ль Эстэр ханъме вэгэр'анд у готе: «Әw к'i йә, йан к'a әw к'ö йә, үе кö жь сәре xwә дәрбаз буйә ван йәка дыкә?» ⁶ Эстәре гот: «Әши мыхәнәт у нәйар, әw һамане һани хъраб ә». Һаман ль бәр п'адше у Эстәре զörьфи һәв. ⁷ П'адша бь һерс к'аса xwә дани, р'абу чу бахче к'оч'кәсәре. Ле һаман ль шыр ма, шәки bona э'мьре хвәлава жь Эстэр ханъме быкә, чымки әши те дәрхъст кö п'адше тыштәки хъраб bona wi զърар кърийә. ⁸ Гава п'адша жь бахче к'оч'кәсәре вэгэр'ийя ода мәсрәфе, дина хвә дайе ва һаман ль сәрт'әхт-п'ала Эстәре к'эти йә. Ынге п'адше гот: «Әве мала мында дәст бавежә ханъма п'адше жи!» Гава әв йәк жь дәве п'адше дәрк'эт, р'уйе һаман

* ^{7:4} Бъ ибрани ha жи те фә'мкърыне: «Ле бәле тә'ли-тәнгийя мъләте мын ныкарън һымбәри зийана п'адше быкън».

³ Ester xanimê lê vege'r'and: «Heger min li ber ç'e've te k'erem dîtîye, p'adşayî xweş be û heger xwestina min li p'adşê xweş tê, bira e'mirê min li min bê p'êşk'êşkirinê û ji ber hîvîkirina minva jî, miletê min! ⁴ Çimkî ez miletê xweva qir'kirin, kuştin û undakirinê'r'a hatine firotanê. Heger em çawa xulam û xulamok hatibûna firotanê, minê qet deng nekira, lê belê neyar nikare zîyana p'adşê lê vege'r'îne*. ⁵ Hingê Ah'aşwêroş p'adşa li Ester xanimê vege'r'and û gotê: «Ew k'î ye, yan k'a ew k'u ye, yê ku ji serê xwe derbaz bûye van yeka dike?» ⁶ Esterê got: «Ewî mixenet û neyar, ew Hamanê hanî xirab e». Haman li ber p'adşê û Esterê qurifi hev. ⁷ P'adşa bi hêrs k'asa xwe danî, r'abû çû baxçê k'oç'ikserê. Lê Haman li wir ma, wekî bona e'mirê xwe lava ji Ester xanimê bike, çimkî ewî tê derxist ku p'adşê tiştekî xirab bona wî qirar kirîye. ⁸ Gava p'adşa ji baxçê k'oç'ikserê vege'r'îya oda mesrefê, dîna xwe dayê va Haman li ser t'ext-p'ala Esterê k'etî ye. Hingê p'adşê got: «Evê mala minda dest bavêje xanima p'adşê jî!» Gava ev yek ji devê p'adşê derk'et, r'ûyê Haman

* ^{7:4} Bi îbranî ha jî tê fe'mkirinê: «Lê belê te'lî-tengîya miletê min nikarin himberî zîyana p'adşê bikin».

к’эфэн кърьн нъхамтын. ⁹ Һынгэ һ’арбонайе, йэк жь нэмере бэрдэстийе п’адше гот: «Ле нэ т’эне эв, ва йэ дарэки бъльндаййа пенщи зэнди жи һаман bona Мордок’ай, йе кё п’адша хълаз кър, назър кърийэ, we ль бэр дэре һаман э». П’адше гот: «Дэ эши һема ль wi дари хын». ¹⁰ һаман ль wi дари хъстън кё эши bona Мордок’ай назър кърьбу. У паше һерса п’адше дани.

8

Эстэр дъгьhiижэ мэрэмэ хwэ

¹ We р’оже Ah’ашшерош п’адш мала һамане нэйаре щьхуйя п’ешк’еши Эстэр ханьме кър, Мордок’ай жи hat р’уйе п’адше к’эт, чымки Эстэрэ готьбу кё эw чи we йэ. ² Һынгэ п’адше гостила дэсте xwэ дэрхьст, к’ижан кё жь һаман стандьбу у эw да Мордок’ай, Эстэрэ жи Мордок’ай ль сэр мала һаманр’а к’ывш кър.

³ Эстэрэ хэбэрдана xwэ диса ль бэр п’адше дъреж кър, xwэ авитэ ныгед wi у бь гъри лава жь wi кър, wэки we хъраби у шешъра һамане Агаги bona զ’р’а щьхуйя назъркъри бьдэ бэталкърье.
⁴ П’адше шьва зер’ин дърежи Эстэрэ кър, Эстэр р’абу сэр xwэ ль бэр п’адше сэкъни ⁵ у гот: «һэгэр ль п’адше xwэш те у мън ль бэр wi к’эрэм дитийэ

k'efen kirin nixamtin. ⁹ Hingê H'arbonayê, yek ji nemêrê berdestîyê p'adşê got: «Lê ne t'enê ev, va ye darekî bilindayîya pêncî zendî jî Haman bona Mordok'ay, yê ku p'adşa xilaz kir, hazır kirîye, wê li ber derê Haman e». P'adşê got: «De ewî hemma li wî darî xin». ¹⁰ Haman li wî darî xistin ku ewî bona Mordok'ay hazır kiribû. Û paşê hêrsa p'adşê danî.

8

Ester digihîje meremê xwe

¹ Wê r'ojê Ah'aşwêroş p'adş mala Hamanê neyarê cihûya p'êşk'êşî Ester xanimê kir, Mordok'ay jî hat r'ûyê p'adşê k'et, çimkî Esterê gotibû ku ew çî wê ye. ² Hingê p'adşê gustîla destê xwe derxist, k'îjan ku ji Haman standibû û ew da Mordok'ay, Esterê jî Mordok'ay li ser mala Haman'r'a k'ifş kir.

³ Esterê xeberdana xwe dîsa li ber p'adşê dirêj kir, xwe avîte nigêd wî û bi girî lava ji wî kir, wekî wê xirabî û şêwira Hamanê Agagî bona qir'a cihûya hazirkirî bide betalkirinê. ⁴ P'adşê şiva zêr'în dirêjî Esterê kir, Ester r'abû ser xwe li ber p'adşê sekinî ⁵ û got: «Heger li p'adşê xweş tê û min li ber wî k'erem dîtîye

у hәгәр әв йәк ль бәр ч'ә've п'адше р'аст ә у әw мън бәгәм дъкә, быра бе ньвисаре кö әw шешьра hамане кöр'e hамьдат'айе Агаги бе бәталкърыне, к'ижан кö әши нә'mә ньвисин кö h'emu qәзайед п'адшада qыр'a щьhуя биньн. ⁶Ньha әзе чаша бъкарьбым бъбиньм хәзәба кö we бе сәре мъләте мън, йан чаша бъкарьбым бъбиньм мърьна пъсмамед xwә?»

⁷ Ah'ашшерош п'адша готә Әстәр ханьме у Мордок'айе щьhу: «hаман кö дәсте xwә hылдабу ль сәр щьhуя, мън мала wi п'ешкеши Әстәре кырийә у әw жи дайә дархъстыне. ⁸Ньha hун бь наве п'адше bona щьhуя чаша дыле wә дыхвазә бънивисын у бь гөстилка п'адше мор кын, чымки ньвисара бь наве п'адше у бь гөстила п'адше моркъри найе бәталкърыне».

⁹ У hынге бист съсейе мәhа Сисане*, awa готи мәhа съсийа ньвиск'аред п'адше hатынә газикърыне, hәр тышт ль гора готына Мордок'ай, щьhуя, wәk'ила, wәлийя у сәршеред qәзар'a, hәр сәд бист h'әфт qәзар'a hатә ньвисаре, жь hындыстане гырти h'эта Әтиупийайе, hәр qәзайер'a бь ньвисара wan, hәр мъләтир'a бь зымане wan, öса жи щьhуяр'a бь ньвисара wan у бь зымане wan. ¹⁰Бь наве

* ^{8:9} Р'ожа ироин әw жь ниве мәhа Майе дәстпедьке h'эта ниве мәhа Ийуне.

û heger ev yek li ber ç'e'vê p'adşê r'ast e û ew min begem dike, bira bê nivîsarê ku ew şêwira Hamanê kur'ê Hamidat'ayê Agagî bê betalkirinê, k'îjan ku ewî ne'me nivîsîn ku h'emû qezayêd p'adşêda qir'a cihûya bînin. ⁶ Niha ezê çawa bikaribim bibînim xezeba ku wê bê serê miletê min, yan çawa bikaribim bibînim mirina pismamêd xwe?»

⁷ Ah'aşwêroş p'adşa gote Ester xanimê û Mordok'ayê cihû: «Haman ku destê xwe hildabû li ser cihûya, min mala wî p'êşkêşî Esterê kirîye û ew jî daye darxistinê. ⁸ Niha hûn bi navê p'adşê bona cihûya çawa dilê we dixwaze binivîsin û bi gustîlka p'adşê mor kin, çimkî nivîsara bi navê p'adşê û bi gustîla p'adşê morkirî nayê betalkirinê».

⁹ Û hingê bîst sisêyê meha Sîwanê*, awa gotî meha sisîya nivîsk'arêd p'adşê hatine gazîkiri-nê, her tişt li gora gotina Mordok'ay, cihûya, wek'ila, welîya û serwêrêd qezar'a, her sed bîst h'eft qezar'a hate nivîsarê, ji Hindistanê girtî h'eta Etyûpîyayê, her qezayêr'a bi nivîsara wan, her miletîr'a bi zimanê wan, usa jî cihûyar'a bi nivîsara wan û bi zimanê wan. ¹⁰ Bi navê

* ^{8:9} R'oja îroîn ew ji nîvê meha Mayê destpêdikê h'eta nîvê meha Îyûnê.

Ah'ашшерош п'адша ньвиси у бъ гёстила п'адше мор кър, да дәсте қәвала у әw лъ мәh'инед тәвла п'адше сийар кърын у шандын, ¹¹ бъ ве йәке да к'ф-ше кё п'адше сәрбәсти дайә щьhуид h'әму бажа-рада, кё пышт бъдьнә пышта hәв, ә'mье xwә xwәй кън у h'әму ч'әкдаред нәйаред xwәйә нава мъләта у қәзада, ғыр' кън, бъкожън, жын у зар'ава к'oke ле биньн у hәбука wан т'алан бъбын, ¹² bona we йәке h'әму қәзайед Ah'ашшерош п'адшада, сездәhe мә-ha донздәha, awa готи сездәhe мәha Адара hatә к'фшкърыне. ¹³ Эw фәрмана ньвисар hәр қәзайеда bona h'әму мъләта чаша қанун hatә ә'ламкърыне, wәки щьhу bona we р'оже hазър бън, кё h'әйфа xwә жъ нәйаред xwә hылдын. ¹⁴ Қәвал лъ мәh'инед п'адше сийар бун, бъ фәрмана п'адше зу р'е к'әтьн чун. Эв йәк лъ Суса қәссырда жи hatә ә'ламкърыне.

¹⁵ Мордок'ай бъ к'ынще п'адшатиийә р'энге ширк у съпи, т'аще зер'ини мәзынва, сәрмълке к'танийи съпи у соре гәвәз wәргүти дәрк'әтә лъ бәр п'адше. Бажаре Сусайе жъ әшда h'әжийа у ша бу. ¹⁶ Ынгә щьhуя р'онаи, әшq, шабун у қәдър дитын. ¹⁷ hәр қәза у hәр бажаре дәра кё фәрман у готына п'адше дыгъниште, әшq у шабун дык'әтә нава щьhуя, р'ожа к'ефе у щәжыне бу. Гәләк жъ мъләтед wәлата дъбунә щьhу, чымки сawa щьhу-я к'әтьбу лъ сәр wан.

Ah'aşwêroş p'adşa nivîsî û bi gustîla p'adşê mor kir, da destê qewala û ew li meh'înêd tewla p'adşê sîyar kirin û şandin,¹¹ bi vê yekê da k'ifşê ku p'adşê serbestî daye cihûyêd h'emû bajarada, ku pişt bidine pişta hev, e'mirê xwe xwey kin û h'emû ç'ekdarêd neyarêd xweye nava mileta û qezada, qir' kin, bikujin, jin û zar'ava k'okê lê bînin û hebûka wan t'alan bibin,¹² bona wê yekê h'emû qezayêd Ah'aşwêroş p'adşada, sêzdehê meha donzdeha, awa gotî sêzdehê meha Adarê hate k'ifşkirinê.¹³ Ew fermana nivîsar her qezayêda bona h'emû mileta çawa qanûn hate e'lamkiranê, wekî cihû bona wê r'oje hazir bin, ku h'eyfa xwe ji neyarêd xwe hildin.¹⁴ Qewal li meh'înêd p'adşê sîyar bûn, bi fermana p'adşê zû r'ê k'etin çûn. Ev yek li Sûsa qesirda jî hate e'lamkiranê.

¹⁵ Mordok'ay bi k'incê p'adşatîyêye r'engê şîrk û sipî, t'acê zêr'înî mezînva, sermilkê k'itanîyî sipî û sorê gevez wergirtî derk'ete li ber p'adşê. Bajarê Sûsayê ji eşqa h'ejîya û şa bû.¹⁶ Hingê cihûya r'onayî, eşq, şabûn û qedir dîtin.¹⁷ Her qeza û her bajarê dera ku ferman û gotina p'adşê digihîstê, eşq û şabûn dik'ete nava cihûya, r'ojâ k'êfê û cejinê bû. Gelek ji miletêd welata dibûne cihû, çimkî sawa cihûya k'etibû li ser wan.

9

Щыhy h'эйфа xwә hылдын

¹ Сездәһе мәһа донздәһа, awa готи мәһа Адаре, гава wә’де фәрман у готьна п’адше пер’а гыништ, h’эта we р’оже дъжмынед щыhyай ль сәр we фыкъре бун, кө we ва h’ёкёми ль сәр wан бъкын, ле bona wан әw дәwр wәлгәr’ийа, чымки щыhyай h’ёкёми ль сәр wан нәйаред xwә кърын. ²We hынг-ге щыhyийед бажаред h’эму qәзайед Ah’ашшерош п’адшада пышт данә пышта hәв, кө дәстед xwә hылдынә ль сәр wан кәсед кө xwaстьнә хърабийе ль wан бъкын у кәсәк ныкарьбу ль бәр wан r’абу-йа, чымки cawa wан k’әтьбу ль сәр h’эму мъләта. ³У h’эму миред qәза, wәk’ил, wәли у wәзиред п’адше пышта щыhyай дъгъртын, чымки cawa Мордок’ай k’әтьбу ль сәр wан. ⁴R’ости жи Мордок’ай мала п’адшеда йәки мәзън бу, нав у дәнгә wi ль h’эму qәза бәла бъбу, öса кө әw мәръв, awa готи Мордок’ай r’ож бь r’ож бъльнд дьбу. ⁵Щыhyай бь шур h’эму нәйаред xwә хъстын, кöштын qыр’кърын у чawa xwәстын öса сәре pәйк’әтийед xwә кърын. ⁶Щыhyай ль Суса qәсърда пенсъд мәри кöштын k’ок ле ани. ⁷Öса жи Паршандат’а, Далпон, Аспат’а, ⁸Порат’а, Адалайя, Аридат’а, ⁹Пармашт’а,

9

Cihû h'eyfa xwe hildidin

¹ Sêzdehê meha donzdeha, awa gotî meha Ada-re, gava we'dê ferman û gotina p'adşê pêr'a gihîşt, h'eta wê r'ojetê dijminêd cihûya li ser wê fikirê bûn, ku wê va h'ukumî li ser wan bikin, lê bona wan ew dewr welger'îya, çimkî cihûya h'ukumî li ser wan neyarêd xwe kirin. ² Wê hingê cihûyêd bajarêd h'emû qezayêd Ah'aşwêroş p'adşada pişt dane pişta hev, ku destêd xwe hildine li ser wan kesêd ku xwastine xirabîyê li wan bikin û kesek nikaribû li ber wan r'abûya, çimkî sawa wan k'eti-bû li ser h'emû mileta. ³ Ü h'emû mîrêd qeza, we-kîl, welî û wezîrêd p'adşê pişta cihûya digirtin, çimkî sawa Mordok'ay k'etibû li ser wan. ⁴ R'astî jî Mordok'ay mala p'adşêda yekî mezin bû, nav û dengê wî li h'emû qeza bela bibû, usa ku ew meriv, awa gotî Mordok'ay r'oij bi r'oij bilind dibû. ⁵ Cihûya bi şûr h'emû neyarêd xwe xistin, kuştin qir'kirin û çawa xwestin usa serê peyk'etîyêd xwe kirin. ⁶ Cihûya li Sûsa quesirda pênsid merî kuştin k'ok lê anîn. ⁷ Usa jî Parşandat'a, Dalpon, Aspat'a, ⁸ Porat'a, Adalya, Arîdat'a, ⁹ Parmaşt'a,

Арисай, Аридай у Wайзат’а, ¹⁰ әв hәр дәһә кör’ед īамане кör’е īамьдат’а, нәйаре щьhуя жи кöштын, ле дәст нәданә hәбука wан.

¹¹ hәма we р’оже h’әсабе кöштийед Суса qәsърда гыништә п’адше. ¹² П’адше gotә Әстәр ханьме: «Щьhуя ль Суса qәsърда пенсьд мәри у hәр дәһә кör’ед īаман жи кöштынә, qыр’ кырынә, гәло qәзайед п’адшайә майинда nyha чь кырынә? Дә бежә, иди чь дыхвази? Әwe бе дайине. Nyha hивикърна тә чь йә? We бе сери». ¹³ Әстәре ле вәгәр’анд у готе: «hәгәр бь дыле п’адше бә, быра сьбе жи щьhуийед Сусайер’а мәщал бе дайине, кö ль гора ве qырара иро быкын у щьhийазе hәр дәһә кör’ед īаман бенә дархьстыне». ¹⁴ П’адше ә’мър кыр, кö оса бьбә. Сусайеда фәрман hатә ә’ламкърье, щьhийазе hәр дәһә кör’ед īаман hатынә дархьстыне. ¹⁵ Щьhуийед Сусайеда чардәhe мәha Адаре жи щьvийан у Сусайеда сессьд мәри кöштын, ле дәст нәданә hәбука wан.

¹⁶ Щьhуийед майийә qәзайед п’адшеда жи щьvийан, пышт данә пышта hәв, кö xwә xwәй кын у жь дъжмына r’ыh’әт бун, жь нәйаред xwә h’әфте пенщ h’әзар мәри кöштын, ле дәст нәданә hәбука wан. ¹⁷ Әв йәка сездәhe мәha Адаре qәшьми у чардәhe we мәhe щьhуийед qәзада r’ыh’әт бун у әw кырынә р’ожа әшде у шабуне.

Arîsay, Arîday û Wayzat'a, ¹⁰ ev her dehe kur'êd Hamanê kur'ê Hamidat'a, neyarê cihûya jî kuştin, lê dest nedane hebûka wan.

¹¹ Hema wê r'oje h'esabê kuştiyêd Sûsa qesirda gihîste p'adşê. ¹² P'adşê gote Ester xanimê: «Cihûya li Sûsa qesirda pênsid merî û her dehe kur'êd Haman jî kuştine, qir' kirine, gelo qezayêd p'adşeye mayînda niha çi kirine? De bêje, idî çi dixwazî? Ewê bê dayînê. Niha hîvîkirina te çi ye? Wê bê sêrî». ¹³ Esterê lê vege'r'and û gotê: «Heger bi dilê p'adşê be, bira sibê jî cihûyêd Sûsayêr'a mecal bê dayînê, ku li gora vê qirara îro bikin û cinyazê her dehe kur'êd Haman bêne darxistinê». ¹⁴ P'adşê e'mir kir, ku usa bibe. Sûsayêda ferman hate e'lam-kirinê, cinyazê her dehe kur'êd Haman hatine darxistinê. ¹⁵ Cihûyêd Sûsayêda çardehê meha Adarê jî civîyan û Sûsayêda sêsid merî kuştin, lê dest nedane hebûka wan.

¹⁶ Cihûyêd mayîye qezayêd p'adşêda jî civîyan, pişt dane pişta hev, ku xwe xwey kin û ji dijmina r'ihe'et bûn, ji neyarêd xwe h'eftê pênc h'ezar merî kuştin, lê dest nedane hebûka wan. ¹⁷ Ev yeka sêz-dehê meha Adarê qewimî û çardehê wê mehê cihûyêd qezada r'ihe'et bûn û ew kirine r'oja eşqê û şabûnê.

¹⁸ Ле щыңујед Сусайеда сездәһ у чардәһе мәhe щьвийан йа xwә кърын у панздәһе мәhe р'ьh'эт бун у әш кърынә р'ожа әшде у шабуне. ¹⁹ Ле бәле щыңујед гёнди, кё дәр у бәстед вәкърида дыман, әшана чардәһе мәha Адаре щәжыне дыкын, чawa р'ожәкә әшде у шабуне у п'ешкеша hәvr'a дышинын.

²⁰ Мордок'ай bona биранине әв йәк ньевиси у нә'mә шандынә h'әму щыңујар'a, к'ижан кё ль qәзайед Ah'ашверош п'адшада дур у незик дыман, ²¹ кё әшана hәр сал нава xwәда чардәһ у панздәһе мәha Адаре к'ыфш кын. ²² Чымки ван р'ожа щыңу жъ нәйаред xwә р'ьh'эт бун у мәha к'әдәра wan бу шабун у шина wan жи бу р'ожа щәжыне, кё ван р'ожа бъкынә р'ожед әшq у шабуне, п'ешкеша бъдьнә hәв у к'әсибар'a хера бъкын. ²³ Щыңуја әв йәк qәбул кър, кё иди к'аре xwә кърбун бъкърана, чь кё Мордок'ай wanr'a ньевиси. ²⁴ Чawa нәйаре h'әму щыңуја, һамане һамьдат'айе Агаги шешври бу, кё qыр'a щыңуја бинә у п'ур авитьбу, awa готи п'әшк, кё wan qыр' кә у к'ока wan бинә. ²⁵ Ле гава Әстәр чу щәм п'адше, п'адше бъ нә'mа ә'mър кър, кё әш шешвра һаманә хъраб, йа кё әши bona щыңуја назър кърбу бе сәре wi у wi көр'ава жи дара хын. ²⁶ Ләма жи ван р'ожар'a готын Пурим, анәгори фә'mина хәбәра пур. Бона

¹⁸ Lê cihûyêd Sûsayêda sêzdeh û çardehê mehê civîyan ya xwe kirin û panzdehê mehê r'ih'et bûn û ew kirine r'oja eşqê û şabûnê. ¹⁹ Lê belê cihûyêd gundî, ku der û bestêd vekirîda diman, ewana çardehê meha Adarê cejinê dikin, çawa r'ojeke eşqê û şabûnê û p'êşkêşa hevr'a dişînin.

²⁰ Mordok'ay bona bîranînê ev yek nivîsî û ne-me şandine h'emû cihûyar'a, k'îjan ku li qeza-yêd Ah'aşwêroş p'adşada dûr û nêzîk diman, ²¹ ku ewana her sal nava xweda çardeh û panzdehê meha Adarê k'ifş kin. ²² Çimkî van r'oja cihû ji neyarêd xwe r'ih'et bûn û meha k'edera wan bû şabûn û şîna wan jî bû r'oja cejinê, ku van r'oja bikine r'ojêd eşq û şabûnê, p'êşkêşa bidine hev û k'esîbar'a xêra bikin. ²³ Cihûya ev yek qebûl kir, ku îdî k'arê xwe kiribûn bikirana, ci ku Mordok'ay wan-r'a nivîsî. ²⁴ Çawa neyarê h'emû cihûya, Hamanê Hamidat'ayê Agagî şêwirî bû, ku qir'a cihûya bîne û p'ûr avîtibû, awa gotî p'esk, ku wan qir' ke û k'oka wan bîne. ²⁵ Lê gava Ester çû cem p'adşê, p'adşê bi ne'ma e'mir kir, ku ew şêwira Hamane xirab, ya ku ewî bona cihûya hazır kiribû bê serê wî û wî kur'ava jî dara xin. ²⁶ Lema jî van r'ojar'a gotin Pûrîm, anegorî fe'mîna xebera pûr. Bona

wan h'emu готьнед ве нэ'ме у ёса жи bona we йэке чь кё дитын у чь кё hatэ сэре wan.²⁷ Щьhy-йа qыrap кыр у эв йэка кырнэ борще стуйе xwэ у р'ык'ынийата xwэ у ёса жи әwed кё гъhiштъбуnэ wan, wэki hэр сал бе тебэр'дан van hэр дö р'ожа анәgorи ньvisар у wэхте wan k'ыш кын.²⁸ Эв р'ож гэрәke qöp'нэ-qöp'нэ бь щэжыне нава hэр qэ-бile, hэр qэzайe у hэр бажарида benэ бираниne. Эв р'ожед Purime гэрәke нава щьhyйада nэyенэ hьldане у бираниna wan жь нава зар'ед wan дэр-næk'евэ.

²⁹ Эстэр ханьма qиза Аbihайил у Мордок'айе щьhy h'эta qэwata wanда чу, wана nэ'ma дöda bona ә'sэйикъryна Purime ньvisин.³⁰ У бь готьнед ә'dьlaijийe у r'astийe nэ'mэ h'emu щьhyяr'a hatыnэ shандыне, yед kё sэd бист h'эft qэzайed Ah'ашweroш p'adшадa dымan,³¹ wэki van r'ожед Purime wэ'dадa k'ыш кын, chawa kё Mорdок'айe щьhy у Эстэр ханьме t'эmi да wan. Wan жи эв йэk кырнэ борще стуйе xwэ у зар'ед xwэ, chawa r'ожи bona oxъrmед wanэ gъranэ hэwap-gазийe у shinе.³² У бь vi awайi фэрманa Эстэрe t'эmi-йa bona Purime ә'sэйi кыр у әw k'ytебeda hatэ ньvisare.

wan h'êmû gotinêd vê ne'mê û usa jî bona wê yekê çi ku dîtin û çi ku hate serê wan.²⁷ Cihûya qirar kir û ev yeka kirine borcê stûyê xwe û r'ik'inyata xwe û usa jî ewêd ku gihîstibûne wan, wekî her sal bê têber'dan van her du r'oja anegorî nivîsar û wextê wan k'ifş kin.²⁸ Ev r'oj gerekê qur'ne-qur'ne bi cejinê nava her qebîlê, her qezayê û her bajarîda bêne bîranînê. Ev r'ojêd Pûrîmê gerekê nava cihûyada neyêne hildanê û bîranîna wan ji nava za-r'êd wan dernek'eve.

²⁹ Ester xanima qîza Abîxayîl û Mordok'ayê cihû h'eta qewata wanda çû, wana ne'ma duda bona e'seyîkirina Pûrîmê nivîsîn.³⁰ Û bi gotinêd e'dila-yîyê û r'astîyê ne'me h'êmû cihûyar'a hatine şandinê, yêd ku sed bîst h'eft qezayêd Ah'aşwêroş p'adşada diman,³¹ wekî van r'ojêd Pûrîmê we'da-da k'ifş kin, çawa ku Mordok'ayê cihû û Ester xanimê t'emî da wan. Wan jî ev yek kirine borcê stûyê xwe û zar'êd xwe, çawa r'oju bona oxirmêd wane girane hewar-gazîyê û şînê.³² Û bi vî awayî ferмана Esterê t'emîya bona Pûrîmê e'seyî kir û ew k'itêbêda hate nivîsarê.

10

Мордок'ай щийе һаман дъгърэ

¹ Паше Ah'ашшерош п'адша кърә сәр wәлет кő хәрщ бъдьн, h'эта әwed кő гъравед бә'рада дъмниң жи. ² Бона qәwat у зорайийа h'әму къред Ah'ашшерош п'адша у мәзънайийа Мордок'ай, кő чawa п'адше әw бъльнд кър у әв h'әму бъ нур-гъли лъ к'теба биранина сәрнатийадайә п'адше Мәдйа у Фарьстанеда нъвисар ә. ³ Бәле Мордок'ай щыhy пәй Ah'ашшерош п'адшар'a йе дöда бу у нава щыhуйада жи мәзън бу, h'ъзкърийед гәләк бъратийа xwә бу, херхwазе мъләте xwә бу у т'әмамийа щымә'tа xwәr'a bona ә'дълайийе хәбәр дъда.

10

Mordok'ay cîyê Haman digire

¹ Paşê Ah'aşwêroş p'adşa kire ser welêt ku xerc bidden, h'eta ewêd ku giravêd be'rada dimînin jî. ² Bonâ qewat û zorayîya h'emû kirêd Ah'aşwêroş p'adşa û mezinayîya Mordok'ay, ku çawa p'adşê ew bilind kir û ev h'emû bi hûr-gilî li k'itêba bîranîna serhatî-yadaye p'adşê Medya û Faristanêda nivîsar e. ³ Belê Mordok'ayê cihû pey Ah'aşwêroş p'adşar'a yê duda bû û nava cihûyada jî mezin bû, h'izkirîyêd gelek biratîya xwe bû, xêrxwazê miletê xwe bû û t'ema-mîya cime'ta xwer'a bona e'dilayîyê xeber dida.